# Aboriya Çandiniyê a Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
## (Zehmetî û Derfet)

Lêkolîneke Derhatî ye ji Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê






Amadekarê lêkolînê:
**Dr. Ebdulrehîm Xilêf**
Gotarbêj di Fakulteya Rêveberiya Karsaziyê
ya Zanîngeha Qurtûbayê de ye


Wergera ji Erebî: Diyala Elî
Redekteya rêzimanî: Bêrîvan Ebdulkerîm

# Aboriya Çandiniyê a Jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê

# (Zehmetî û Derfet)

Lêkolîneke Derhatî ye ji Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê

Amadekarê lêkolînê

Dr. Ebdulrehîm Xilêf

Gotarbêj di Fakulteya Rêveberiya Karsaziyê ya Zanîngeha Qurtûbayê de ye

Mafên Weşanê 2025 © Beşa Lêkolîn û Xebatên Akademîk ên Rêkxistina GAV ya Alîkarî û Geşepêdanê

Wergera ji Erebî: Diyala Elî
Redekteya rêzimanî: Bêrîvan Ebdulkerîm

2025

**Naveroka Lêkolînê**

- ✓ Destpêk
- ✓ Girîngiya lêkolînê
- ✓ Armancên lêkolînê
- ✓ Rêbaza lêkolînê
  - ➢ Çavkaniyên sereke
  - ➢ Çavkaniyên nesereke
  - ➢ Şêwazên analîzê

**Çarçoveya teworîk**

- Têgîna aboriya çandiniyê ya jinan
- Pênaseya aboriya çandiniyê ya jinan
- Rola jinê di aboriya çandiniyê de li ser asta cîhanê
- Girîngiya beşdariya jinan di aboriya Çandiniyê de
- Rola jinê di beşa çandiniyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
- Çalakiyên çandinî yên ku jin di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de tê de beşdar dibin
- Bandora beşdariya jinan di çandiniyê de li ser aboriyê herêmî
- Encamên şerê li ser aboriya çandiniyê ya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
  - Yekem: Bandora şerê çekdarî li ser gihîştina bo bazaran
  - Duyem: Bandora şerê çekdarî li ser gihîştina bo çavkaniyên çandiniyê
  - Sêyem: Bandora şerê çekdarî li ser karê planîkirina berdewam bo pêşerojê
- Bandorên ekolojî yên li ser jinên cotkar li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê
  - Yekem: Guhertina avhewayê
  - Duyem: Çolbûn (dessertîfîkasyon)
- Zehmetiyên ku jin di aboriya çandiniyê de dikişînin
  - Yekem: Hêrsên civakî û çandî
  - Duyem: Hêrsên aborî
  - Sêyem: Hêrsên girêdayî bazarê
  - Çarem: Hêrsên qanûnî û siyasî
  - Pêncem: Hêrsên ekolojî û avhewayê
  - Şeşem: Hêrsên girêdayî bi binesaziya bingehîn ve
  - Heftem: Hêrsên tenduristî
  - Heştem: Hêrsên girêdayî mafdanîkirin û serokatî

- Derfetên berdest bo pêşxistina rola jinê di aboriya Çandiniyê de

  Yekem: Derfetên civakî û çandî

  Duyem: Derfetên aborî

  Sêyem: Derfetên siyasî û rêvebirî

  Çarem: Derfetên ekolojî û avhewayê

  Pêncem: Derfetên teknolojîk

  Şeşem: Derfetên girêdayî mafdanîkirin û serokatiyê

**Çarçoveya pratîk:**

- Forma lêpirsînê
- Pêşkêşkirina encamên lêpirsînê
  - Beşa Yekem: Agahiyên kesayetî
    - Yekem: Temen
    - Duyem: Rewşa civakî
    - Sêyem: Asta xwendinê
  - Beşa Duyem: Kar û çavkaniya aborî
    - Yekem: Xwezaya kar
    - Duyem: Ezmûn (serborî)
    - Sêyem: Analîza bersivên beşa duyem
  - Beşa Sêyem: Hêrs (Zehmetî)
    - Yekem: Zehmetiyên sereke yên di kar de
    - Duyem: Analîza bersivên beşa sêyem
  - Beşa Çarem: Derfet û analîza wan

✓ Encamên lêkolînê

✓ Pêşniyar

✓ Çavkaniyên zanistî

✓ Pêveka Yekem: Jinine ji Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ku bi karên cuda di aboriya Çandinî ya jinan de beşdar in

✓ Pêveka Duyem: Forma lêpirsînê

## ✓ Destpêk

Aboriya çandiniyê ya jinan weke bingeheke sereke bo geşpêdana gundîtiyê ya berdewam tê hesibandin. Jinan roleke girîng di hilbirîna çandiniyê û rêveberiya çavkaniyên xwezayî de lîstin, bi taybetî di herêmên ku çandinî çavkaniya sereke ya jiyanê ye.

Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê, jinan dikarîbû bi roleke girîng di beşa çandiniyê de, weke beşdareke çalak û xebatkar di rewşên aborî, civakî û siyasî yên ku di encama şerê bi salan de rû da, herweha guhertinên peykerî di civakên herêmî de pêk anî. Her çendîn jiyana jinan di vê qadê de bi pêş ketiye û xweş tê nîşandan, lê gelek kêşe û hêrsên cuda hene ku rûbirûyî wan tên, weke kêşeyên girêdayî bi milk û malan ve, gihîştina bo çavkaniyên çandiniyê, piştgiriyên aborî û teknolojîk, herweha kêşeyên civakî û çandî yên ku dikarin hêzeke mezin li dijî serxwebûna wan ya aborî bilîzin.

Ev lêkolîn bi armanca ku roniyê biavêje li ser rastiyên aboriya çandiniyê ya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê, bi rêya nîşandana rola jinan di hilbirîna çandinî û zencîreyên nirxî yên pê ve girêdayî de dixebite. Di heman demê de, lêkolîn bo analizkirina hêrs û kêşeyên ku dikevin di rêya pêşveçûna wan de kar dike.

Herweha, lêkolîn hewl dide ku darfetên berdest bibîne bo pêşxistina beşdariya jinan ya aborî, bi rêya çalakiyên herêmî an jî bi piştgiriya destgirtiyên jinan yan bi pêşkêşkirina derfetên baş ji bo gihîştina wan bo çavkaniyên çandinî û sûkan.

Ji bo berçavkirina girîngiya zêde ya rola jinan di jinûavakirina civakên gundî de, ev lêkolîn gotûbêjê li ser awayên pêşxistina aboriya çandinî ya jinan û pejirandina siyasetên piştgirî, fêrbûna pîşeyî, asayîkirina destbarîkirinê, piştgiriya projeyên piçûk û navîn, herweha afirandina atmosfereke civakî ku alîkariyê di mafdanîkirina aborî ya jinan de dike. Herwiha, lêkolîn guftûgoyê li ser çareseriyên guncaw derbarê kêşe û astengiyên ku rastî jinê di qada çandiniyê de tên dike.

Ev lêkolîn alîkariyê di gotûbêja herêmî ya li ser rola jinan di pêşvebirina çandiniyê de dike, û armanca wê ya sereke ew e ku pêşniyarên pratîkî pêşkêş bike yên ku dikarin alîkariya çêkerên biryar û saziyan di danîna siyasetên dadmend û çalak ji bo geşkirina rewşa aboriya çandiniyê ya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bike.

- **Girîngiya lêkolînê:**
  1. Ronakkirina rola jinê di pêkanîna ewlehiya xwarinê û geşepêdana berdewam a herêmî de.
  2. Analîzkirina astengiyên ku beşdariya jinan di aboriya çandinî de digirin û pêşinyara çarenûsên ku dikarin rola wan biparêzin.
  3. Lêgerîna li derfetên ku dikarin beşdariya jinên gundî di geşepêdana aborî de biparêzin.
- **Armanca lêkolînê:**
  1. Analîzkirina rola jinan di aboriya çandiniyê ya Bakûr û Rojhilata Sûriyê de, bi diyarkirina beşdariya wan di hilberîna çandinî de, çêkirina qeltaxên aborî û rêvebirina projeyên piçûk.
  2. Diyarkirina astengiyên herî girîng yên ku jin di vê qadê de dijî, di nav wan de astengiyên aborî, civakî û ekolojîk.
  3. Nîşandana derfetên ku dikarin beşdariya jinan di geşepêdana qada çandiniyê de zêde bikin.
  4. Pêşkêşkirina pêşnîyarên pratîk ji bo xurtkirina rola jinan di aboriya çandiniyê de, ku dikare ber bi geşepêdana berdewam ya herêmê ve bibe.
- **Rêbaza Lêkolînê:**

Ev lêkolîn li ser rêbaza danasîn û analîzê ye da ku têgihîştinekê derbarê rastiya aboriya çandiniyê ya jinan li Bakûr û Rojhilata Sûriyê bide herweha analîzkirina astengî û derfetên ku hene bo xurtkirina rola jinan di vê qadê de.

Lêkolîn bi bikaranîna amûr û çavkaniyên jêrîn hat xebitandin da ku dane berhev bibin û wan analîz bike:

- **Çavkaniyên sereke:**
  1. Lêpirsîn: Ji bo girtina nêrîn û ramanên jinên ku di qada çandiniyê de dixebitin li ser astengiyên ku dijîn û derfetên ku hene bo xebitandina wan di warê aboriyê de.
  2. Têbîniyên qada xebatê: Bi serdana qadên çandiniyê yên ku jin di wan de cih digirin.
- **Çavkaniyên neserekî:**
  1. Lêveger derbarê edebiyata zanistî ya girêdayî bi aboriya çandiniyê ya jinan û geşepêdana gundîtiyê.

2. Lênerînek li ser raporên parastinî yên ji aliyê rêxistinên herêmî û navneteweyî ve ku rola jinan di çandiniyê de li Sûriyê rave kirine.
3. Analîzkirina siyaseta çandiniyê ya ku têkildarî jinan dibe di herêmê de.

- **Şêwazên analîzê:**

1. Analîza Cureyî ya Têbîniyên Qada Xebatê: Ji bo diyarkirina şêwaz û astengiyên sereke.
2. Analîza Jimarî ya Lêpirsînê: Ji bo ragihandina alî û hûrguliyên têkildar bi beşdariya jinan di çandiniyê de.

**Çarçoveya Teworîk**

- **Têgîna Aboriya Çandiniyê ya Jinan:**

Qada çandiniyê yek ji girîngtirîn qadên aborî ye ku civakên gundî yên li Bakûr û Rojhilata Sûriyê li ser dixebitin. Ev qad çavkaniyeke sereke ye ji bo derbasbûnên aborî û yek ji bingehên ewlehiya xwarinê û pêkanîna xwemaliyê. Jinan roleke girîng di vê qadê de lîstine — hertim di cotkirina zeviyan, xwedîkirina lawiran yan jî di nav pîşesaziyên çandiniyê yên guhêrbar de.

Herçiqas beşdariya wan rastî hindek astengiyan tê, wekî kêmbûna derfetên bidestxistina çavkaniyan, lawazbûna parastina mafî û kevneşopiyên civakî yên ku serxwebûna wan ya aborî asteng dikin.

- **Pênaseya Aboriya Çandiniyê ya Jinan:**

Aboriya çandiniyê ya jinan weke qadeke zankoyî ya pirr-taybetmendî tê nasîn ku li ser xwendina rolên aborî û civakî yên jinan di çandiniyê de radiweste û bi taybet di doza dadperweriya zayendî û xebitandina jinan de. Ev qad girîngiyê dide lêpirsînên mîna siyaseta cotkarî û aborî ku çawa bandorê li jiyana jinan bandor dike û çawa dikare beşdariya wan di biryardayînê de zêde bike û rewşa wan ya aborî baştir bike.

Herweha astengiyên ku rastî jinan tên vedihewîne, wekî zehmetiyên gihîştina bo çavkaniyên mîna (welat, perepêdan, teknolocî, perwerde), newekhevî di fonan de û bargiraniya ku di encama karên malî û çandiniyê de derdikevin. (Agarwal, 1994)

Herwisa aboriya Çandiniyê ya jinan li ser xwendina rola jinan di hilberîna çandiniyê de û bandora wê li ser geşepêdana aborî û civakî dixebite. Her wekî din li ser analîzkirina awayê belavkirina çavkaniyên çandiniyê di nav zayendan de xebitiye û astengiyên ku beşdariya çalak a jinan dorpêç dike, di heman demê de rola wan di pêkanîna ewlehiya xwarinê û berdewamiya ekolojîk de dişopîne.

- **Rola Jinan di Aboriya Çandiniyê de li ser Asta Cîhanê:**

Jinan roleke girîng di aboriya çandiniyê ya cîhanî de lîstine, ji ber ku wekî hêzeke mezin ji karkeran di warê çandiniyê de û bi taybet li welatên hejar tên hilbijartin. Li gorî raporên Rêxistina Xwarin û Cotkarî ya Neteweyên Yekbûyî (FAO), jin nêzî 43% hêza karê çandinî ya di welatên hejar de ye. Ev yek zêdetir tê dîtin li herêmên Başûrê Afrîkaya jêrîn û li Başûrê Asyayê ku têdigihîje 50% an zêdetir.

Rolên jinê yên gelek û sereke di qada çandiniyê de hene, ew jî ev in:

1. Hilbirîna Çandiniyê: Jin bi karên çandina zevî û xwedîkirina ajalan radibin ku ev beşdarî rasterast bi awayekî erênî bandorê li ewlehiya xwarinê dike.
2. Berhevkirina xwarin û avê: Di gelek herêmên gundî de, jin xwarinên warî û avê berhev dikin ku ev kar demxwar û hêzdaxwaz in.
3. Çareserkirina xwarinê: Jin roleke sereke di çareserkirin û enbarkirina xwarinê de dilîze, ev yek dihêle ku xerckirina wê kêm bibe û nirxê wê zêde bibe.

4. Rêveberiya çavkaniyên xwezayî: Jin xwedî hêz e rêveberiya çavkaniyên xwezayî wek ax û avê bikin, bi rêya bikaranîna zanînên kevneşopî ku ji bav û kalan girtine.

(Desteya Neteweyên Yekgirtî ya Jinan, 2017)

- **Girîngiya beşdariya jinan di aboriya çandiniyê de:**
  1. Pêkanîna geşpêdana domdar bi rêya zêdebûna hilbirîna çandiniyê.
  2. Başkirina asta jiyanî li herêmên gundî.
  3. Kêmkirina cudahiya aborî ya di navbera zayendan de.
  4. Bicihkirina ewlehiya xwarinê bi rêya rola jinê di rêveberî û hilbirîna xwarinê de.
- **Rola jinê di qada çandiniyê de li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de:**

Jin di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de wekî beşeke sereke di qada çandiniyê de tên hesibandin. Ew roleke bingehîn dilîze di pêkanîna ewlehiya xwarinê û geşedana aborî ya herêmê de. Her çendîn astengiyên mezin ên weke şerên çekdar û rewşa dijwar a aborî hene, lê jin bi hêz xwe di vê qada girîng de bi cih dike û beşdar dibe bi xurtî.

Di van herêman de, çandinî çavkaniya sereke ya derbasbûnên aborî ye bo gelek malbatan, û jin bi awayekî mezin beşdarî hemî qadamên pergala cotyariyê dibin — ji çandina zeviyan û berhemên wan girtin, heta rêveberiya çavkaniyên avê û firotina berhemên cotyarî. Zêdetir jî jin di xwedîkirina lawiran de dixebitin, çêkirina şîr û berhemên wan, enbarkirin û dayîna xwarinê de, ku ev kar hemû di pêşvebirina aboriya herêman de beşekî girîng digirin.

Di salên dawî de, hewldanên zêde hatin kirin bo xurtkirina jinan di qada cotyarî de, bi rêya perwerde û alîkariya teknîkî. Ev şandeyên alîkariyê hêsanbûna van karan bo jinan zêde kir herweha beşdariya wan di biryarên pêwendîdar bi cotyarî ve zêde kir. Her wekî din, destpêşxeriyên herêmî û navneteweyî roleke girîng di pêşxistina jinan de lîstin, bi hêsankirina gihîştina bo çavkaniyên çandiniyê wekî ax, tov û amûrên çandiniyê.

Jin di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de, bi taybetî di herêmên gundî de, roleke sereke di aboriya cotyarî de lîstin. Li gorî raporên Rêxistina Neteweyî ya Xwarin û Cotyarî (FAO) û lêkolînên herêmî, jin bi rêjeyeke bilind di karên cotyariyê de li Sûriyayê cihê xwe digirin. Ew bi çalakiyên çandinî û cotyarî yên cûrbecûr radibin ku dihêle ewlehiya xwarinê û derbasbûnên aborî bo malbata wan geştir bibe.

(FAO, 2020)

- **Çalakiyên çandiniyê yên ku jin di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de beşdar dibin:**

Jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de roleke sereke di çandiniyê de lîstin û beşdariya wan di çalakiyên li jêr de xuya dike:

1. Çandina zeviyên bingehîn weke genim, ceh, pembû û sebzeyan.
2. Xwedîkirina lawiran û çêkirina şîr û goşt.
3. Pîşesaziyên cotyarî wek çêkirina penîr, murabbayên fêkî û hilanîna xwarinên demsalî.

4. Xebat di baxçeyên çandiniyê de û çandina darên berhemder û şînatiyan bo saxlemkirina tenduristiyê. (UNDP, 2019)

- **Bandora beşdariya jinê di çandiniyê de li ser aboriya herêmî:**
  1. Zêdekirina berhemên hilbirîna cotyarî û gihîştina ber bi têrbûna xweyî ve.
  2. Başkirina derbasbûnên darayî bo malbatê û pêşxistina ewlehiya aborî.
  3. Pêşvebirina rola destgirtiyên çandinî weke rêyekê bo xurtkirina jinan di aboriyê de. (Rêxistina Jinê ya Erebî, 2019)

- **Bandora şer li ser aboriya çandiniyê ya jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de:**

Aboriya çandiniyê ya jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de rastî astengiyên mezin dibe ji ber şerê berdewem li herêmê, ku bi awayekî rasterast bandor li ser karîgeriya jinan li bazar û çavkaniyên cotyariyê kir. Vê rewşê hişt ku astengî li pêşberî pilankirina domdar a pêşketinê derkeve.

**Yekem: Bandora şer li ser gihîştina bo bazarên firotanê**

- Wêranbûna binesaziya bingehîn, bi taybetî rê û pir: Şer gelek rê û pirên bingehîn wêran kir, vê yekê hişt ku gihîştina bo bazaran bi dijwarî û bi xerckirineke mezin bibe. Ji ber vê yekê, jinên ku cotyarî çavkaniya sereke ya derbasbûnên wan ya darayî ye, zehmetî di veguhestina hilbirînên xwe de bo bazaran dîtin.
- Neewlehî: Rewşa neewlehiya herêmê bûye sedemek ku jin nikaribin bi azadî li bazaran bigerin bo firotina berhemên xwe. Hêrs û tirs ji tecawuz û tundiyê tevgera wan û şensên wan ji bo firotina berhemên cotyariyê kêm dike.
- Kêmbûna bazarên herêmî: Guhertina mezin a gundan û civakî dibe sedem ku bazarên herêmî kêm bibin. Vê yekê jî şensên firotinê yên berhemên cotyariyê kêm kirin ku bandoreke neyînî li ser derbasbûnên darayî yên jinan kir.
- Nizimbûna hêza kirînê: Ji ber şerê dirêj, hêza kirînê ya gelê herêmê nizim û lawaz bû ku ev jî dibe sedem ku daxwaz li berhemên cotyarî kêm bibe. Ev rewş jî derbasbûnên jinan yên darayî kêm dike.

**Duyem: Bandora şer li ser gihîştina bo çavkaniyên çandiniyê**

- Kêmbûna derbasbûyên çandiniyê: Şerê heyî sedem e ku hatinên çandiniyê bên sekinandin, ev yek jî gihîştina bo tov, gubre û kêzkujan zêde dijwar dike. Ev rewş bi awayekî rasterast bandor li ser hilberîna zevîdarên ku jin rêveberiya wan dike kir.
- Wêranbûna zeviyên çandiniyê: Gelek zeviyên çandiniyê hatin wêrankirin bi sedema şerê ku tê meşandin, herweha qirêjbûnên neasayî ku di encama van pevçûnan de çêdibe. Herweha van bûyeran hişt ku rûberên çandiniyê jî kêm bibin tev li sînordarkirina karînên jinan di hilberînê de.

- Kêmbûna avê: Şer binesaziya bingehîn a avê hildiweşîne ku ev yek dihêle gihîştina bo çavkaniyên avê dijwar û zehmetir bibe. Herweha bandoreke neyînî jî li ser hilberînên çandiniyê yên avîdike.

**Sêyem: Bandora şer li ser karîgeriya plankirina domdar bo pêşerojê**

- Neewlehiya siyasî: Neewlehiya siyasî dibe sedemeke girîng bo astengkirina jinan di plankirina domdar ya pêşerojê de, ji ber ku guhertinên herdem ên li siyaset û rêveberiyan bar dibe, hêza wan ji bo planên dirêj û domdar kêm dike.
- Kêmbûna piştgiriya darayî: Şer dibe sedem ku piştgiriya darayî bo beşa çandiniyê kêm bibe. Ev yek jî hêza jinan kêm dike ku karibin hilbirînên xwe belav bikin û bêhtir bi kar bînin.
- Kêmbûna perwerde û fêrbûnê: Şer şensên fêrbûnê û perwerdehiyê bo jinan kêm dike herweha karînên wan bo hilgirtina teknîkên nûjen û domdar yên cotyariyê sînordar dike.

- **Bandorên ekolojî li ser jinên cotkar li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê:**

**Yekem: Guhertina avhewayê**

- Guhertina şêwazên barîna baranê: Guhertina avhewayê dibe sedem ku baran ne bi rêk û pêk bibare, ev yek bandorê li peydakirina avê ji bo zeviyan dike. Ji ber ku bi gelemperî jin yên ku berpirsyartiya birêvebirina avê di malbatên cotyar de dikin, ew astengiyên mezin li pêşberî xwe dibînin ji bo avdana zeviyan.
- Bilindbûna germahiya hewayê: Bilindbûna germahiya hewayê dibe sedem ku av ji erdê hilbikele, ev yek dihêle ku şiliya erdê kêm bibe û bandorê li berhemên çandiniyê dike. Ev rewş karên jinan zêde dike, bi taybetî yên ku hilbirîna berhemên çandiniyê diparêzin.

**Duyem: Çolbûn**

- Jidestxistina zeviyên çandiniyê: çolbûn dibe sedema jidestxistina zeviyên têr şînkahî, ku dihêle rûberên çandiniyê kêm bibin. Ev rewş bi awayekî rasterast bandorê li jinên cotyar yên ku debara wan û malbata wan li ser çandiniyê ye dike.
- Kêmbûna çêrgehan: Çolbûn bandorê li çêrgehan jî dike û dibe sedema kêmbûna êm ji bo lawiran herweha nirxê wê bilind bibe. Di encamê de barê kesên ku bi van karên wisa radibin û mîna çavkaniyeke darayî ye bo wan zêde dike.

- **Astengiyên ku jin di aboriya çandiniyê de dijîn:**

Astengiyên ku rastî aboriya çandiniyê ya jinan di Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de tên piralî ne, mîna— civakî, aborî, siyasî û ekolojî. Ev herêma ku parêzgehên Hesekê, Reqa û Dêra zorê dikevin bin

sîwana wê, ji tawanên şerê Sûriyê ku zêdetirî dehsalan berdewam e, êşê dikişînin. Vî şerê domdar bandor li binesaziya bingehîn a çandiniyê û jiyana cotkaran bi taybet a jinan kir.

**Yekem: Astengiyên civakî û çandî**

- Rolên kevneşop yên herdu zayendan: Di gelek civakên gundî yên li Sûriyê de, hîn jî rolên kevneşop yên zayendî cih û navê jinê di civakê de diyar dikin. Gelek caran, cotyarî wekî karê mêr tê dîtin, ku ev yek şensên jinan û beşdariya wan di çalakiyên aboriya çandiniyê de têk dibe.
- Gihîştina sînordar bo perwerde û fêrkirinê: Jin bi zehmetî dikarin bigihêjin perwerdeya cotyariyê û fêrkirina li ser şarezayîyên nûjen, ev yek hêza wan bo başkirina berhemên çandiniyê yên zeviyan têk dibe.
- Sînorên civakî li ser tevgerê: Tevger û gera jinan ya derveyî malê rastî qeyd û bendan tên, ev yek dihêle ku gihîştina wan bo bazaran û beşdarbûna wan di çalakiyên çandiniyê de herweha bidestxistina derbasbûnên hilbirînê asteng bibe.

(Desteya Neteweyî ya Jinan – UN Women, 2018)

**Duyem: Qewxekirinên aborî**

- Gihîştina sînordar a çavkaniyên darayî: Jin hewcedarên wergirtina qerdan e ji bo kirîna tov, zibil, û alavên çandiniyê û di vê mijarê de bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin, ji ber ku saziyên giştî an nîv-gelemperî pirî caran di pêvajoya dayîna deynan de bi mêran re mijûl dibin, nemaze li deverên gundewarî.
- Lawazbûna xwedîderketina li aboriya çandiniyê: Jin li gorî mêran xwedan rêjeyeke kêmtir in ji zeviyên çandiniyê, ev jî şiyana wan a girtina biryarên têkildarî hilberîna çandiniyê sînordar dike.

(Rojnameya Lêkolînên Çandinî ya Sûriyê, 2019)

- Mûçeyên kêm: Dema ku jin wek karkerên çandiniyê dixebitin, pir caran ji bo heman karî ji mêran kêmtir fonan distînin, ev yek cudahiya zayendî xurt dike.

**Sêyemîn: Pirsgirêkên bazarê**

- Gihîştina sînordar bo bazaran: Jin di gihandina bazarên xwecihî û herêmî de bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin ji ber astengiyên ewlekarî û civakî, herweha ji ber bandora pevçûnan li ser torên rê, pir û binesaziyên din.
- Nebûna kenalên belavkirinê yên bi bandor: Cotkarên jin bi gelemperî xwe dispêrin navbeynkaran da ku hilberên xwe bifroşin, ev yek jî qezenca wan kêm dike.

**Çarem: Pirsgirêkên yasayî û siyasî**

- Jin ne xwediyê heman mafên mêran in di milkiyeta zeviyên çandiniyê de, ev jî şiyana wan a sûdwergirtina ji projeyên çandiniyê sînordar dike.

- Nebûna polîtîkayên giştî yên herêmî an jî yên hikûmetê ku bi bandor piştgiriya beşdarbûna jinan di beşa çandiniyê de dike.
- Bandora nakokî û nearamiya siyasî li ser karîna jinan a ku bi awayekî azad di çandiniyê de dixebitin.

(Rapora Komîsyona Lêkolînê ya Navneteweyî, 2023)

**Pêncem: Pirsgirêkên jîngeh û avhewayê**

- Guhertina avhewayê: Li herêmê, ji ber ziwabûna berdewam û kêmbûna avê, bandorên dijwar li ser hilberîna çandiniyê tên kirin. Jinên ku bi giranî xwe dispêrin çandiniya bi ava baranê, bi taybetî bi van guhertinan bandor dibin. (IFAD, 2023)
- Qelsbûna axê: Bikaranîna zexm a zeviyên çandiniyê bêyî rêveberiya domdar û zivirîna çandiniyê bûye sedema qelsbûna axê herweha hilberîna çandiniyê jî kêm dike.
- Kêmbûna avê: Herêm rastî kêmasiyeke giran a avê tê ji ber siyasetên Tirkiyê ku bi avakirina bendavan li ser çemê Firatê û qutkirina ava çemên din ên ku hevkêş in bi çemên Firatê re, wek çemên Xabûr û Ceqceq, bandorê li avdana zeviyan dike.

**Şeşem: Pirsgirêkên girêdayî bi binesaziyê ve**

- Hilweşîna binesaziyê: Şer gelek rê, pir û dezgehên çandiniyê wêran kirine, gihandina berheman bo bazaran asteng kiriye.
- Kêmbûna teknolojiya nûjen: Gelek cotkarên jin ji ber nebûna teknolojiya nûjen û alavên pêşketî xwe dispêrin rêbazên çandiniya kevneşopî.

**Heftem: Qewxekirinên tenduristiyê**

- Barên tenduristî: Karên giran ên çandiniyê dikare bandorê li tenduristiya jinan bike, nemaze ji ber nebûna xizmetguzariyên tenduristiyê li gundan.
- Têberkirin li hemberî heyberên kîmyewî: Jin ji ber nebûna perwerdehiya pêwîst li ser tedbîrên pêşîlêgirtinê yên pêwîst, bi heyberên kîmyewî yên çandiniyê yên wekî gubre û dermanan re rû bi rû dimînin.

**Heştem: Qewxekirinên bi hêz û rêberiyê ve girêdayî ne**

- Beşdarbûna kêm di biryargirtinê de: Jin kêm caran beşdarî biryarên têkildarî çandiniyê li ser asta malbatê an civakê dibin.
- Nebûna rêxistinên piştevaniya jinan: Pêwîstî bi rêxistinên zêdetir heye ku piştgiriya mafên jinên cotkar bikin û perwerde û çavkaniyan bidin wan.

Ji bo derbaskirina van kêşeyan pêwîstî bi hewldanên yekgirtî yên rêveberiyên herêmî, rêxistinên navdewletî û civaka sivîl heye, ji bo bihêzkirina jinan di beşa çandiniyê de û bi destxistina pêşketineke domdar li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê.

- **Derfetên zêdekirina rola jinan di aboriya çandiniyê de:**

Tevî gelek kêşeyên li pêşiya aboriya jinan a çandiniyê li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê, derfetên girîng hene ji bo bihêzkirin û pêşxistina rola wan di vê beşa jiyanî de ku dikarin bên bikaranîn. Ev derfet karîgerên civakî, aborî, siyasî û hawirdorê di nav xwe de dihewîne û dikare bibe alîkar ku bigihêje geşepêdana domdar û baştirkirina şert û mercên jiyanê yên jinên herêmê.

Li jêr analîzeke berfireh a van derfetan heye:

**Yekem: Derfetên civakî û çandî**

- Guhertina rolên kevneşopî: Her ku civak bi girîngiya rola jinê di geşepêdana aborî de haydar dibe, derfetên guhertina rolên kevneşopî û zêdekirina beşdariya jinan di çandiniyê de derdikevin holê û zêdetir dibin. (Jin Niha, 2020)
- Pêşvebirina perwerde û hîndekariyê: Zêdekirina bernameyên perwerdehiya çandiniyê û fêrkirinê dihêle ku jin di çandiniya nûjen, rêveberiya cotkariyê û destgirtiyên çandiniyê de bi hêztir bibin.
- Piştgiriya destgirtiyên jinan: Hin rêxistinên mirovî gelek bernameyên rahênan û geşepêdanê pêk anîne ji bo teşwîqkirina avakirina destgirtiyên çandiniyê ku jin tê de beşdar dibin an jî têne birêvebirin. Vê yekê hişt ku bihêzkirina wan a aborî û peydakirina platformek ji bo fêrbûn û pevguhertina ezmûnan xurttir û biwatetir bibe.

**Duyem: Derfetên aborî**

- Zêdekirina gihandina darayî: Pêşxistina sîyaseta hin rêxistinên navdewletî û herêmî ku deyn û bexşeyên piçûk bi taybetî ji jinan re didin da ku dest bi projeyên çandiniyê bikin an çandiniyên xwe yên heyî pêşve bibin.
- Pêşketina zincîra nirxî: Tevlîbûna jinan di zincîreyên nirxî yên çandiniyê de bi hilberandin û firotina berhemên bi nirxên zêdetir, wek şêranî, tirş, û xwarinên çêkirî, ku di bazarên herêmî de her ku diçe diyar bûne, zêde bûye.
- Belavbûna bazarên herêmî, bi taybetî li gundan, ji jinan re platformek çêkiriye ku berhemên xwe nîşan bidin û bifiroşin.
- Sûdwergirtina ji amûrên belavkirinê: Zêdekirina gihîştina hilberên jinan ji bo bazarên herêmî bi afirandina kenalên belavkirinê yên bi bandor û piştgirîkirina wan bi teknolojiya nûjen, her çiqas ew amûrên belavkirinê hêsan bin jî, weke statûyên WhatsApp an posteke Facebookê ji bo hin pisporên jin.

**Sêyem: Derfetên siyasî û sazûmanî**

- Piştgiriya xwecihî: Rêveberiya Xweser a Bakûr û Rojhilatê Sûriyê polîtîka û bernameyên ku piştgiriya jinan di beşa çandiniyê de dike, weke dabînkirina zevî û çavkaniyan amade kiriye û bi pêş dixe. (Qaseya Jinê ya Durya, 2023)
- Zêdekirina beşdariya di biryardanê de: Zêdekirina nûnertiya jinan di meclîsên xwecihî û çandiniyê de ji bo ku pêwîstî û berjewendiyên wan li ber çavan bên girtin.

- Piştgiriya rêxistinên jinan: Zêdekirina çalakiya hin rêxistinên jinan ên herêmî û navneteweyî ji bo piştgiriya jinên cotkar bi riya perwerdekirin, belavkirin û parastina mafên wan.

**Çarem: Derfetên jîngeh û avhewayî**

- Çandiniya Berdewam: Zêdekirina beşdariya jinan di bernameyên çandiniya domdar de ku li ser bikaranîna bikêrhatiyên çavkaniyên xwezayî çêdibe, weke avdana bi rêya dilopan û birêvebirina axê.
- Çandiniya organîk: Pêşxistina çandiniya organîk dikare ji jinan re derfetan peyda bike ku bigihêjin bazarên nû yên ku daxwaziya hilberên hawirdorparêz dikin.
- Rêvebiriya Çavkaniyên Avê: Beşdarbûna jinan di bernameyên birêvebirina avê de ji bo baştirkirina karîgeriya avdanê û dabînkirina domdariya çavkaniyên avê.

**Pêncem: Derfetên teknolojîk**

- Belavkirina Dîjîtal: Zêdetir, karsazên jin platformên medyaya civakî bi kar tînin da ku hilberên xwe rasterast ji kesên ku dikirin re bifroşin, û rola navbeynkaran kêm bikin.
- Enerjiya nûjenkirî: Belavbûna girîng a enerjiya rojê di avdaniyê û xebitandina alavên çandiniyê de, ku lêçûnê kêm dike û karbidestiyê zêde dike.

**Şeşem: Derfetên girêdayî bi hêz û serkirdayetiyê**

- Avakirina karînên serkirdayetiyê: Pirkirina derfetan ji bo pêşkêşkirina bernameyên perwerdehiyê ji bo zêdekirina jêhatîbûna rêberiya jinan, da ku ew bikaribin roleke mezintir di biryardana çandiniyê de bilîzin.
- Parêzgerî ji bo mafên jinan: Bang li rêxistinên jinan tê kirin ku siyasetên piştevaniya mafên jinan di beşa çandiniyê de bikin, weke wekheviya mûçe û gihandina çavkaniyan. (Kovara El-Cumhuriye, 2022)

Derfetên ku ji bo xurtkirina aboriya çandiniyê ya jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê berdest in, pir û cihêreng in, lê ji bo van derfetan pêwîstî bi xebatên hevbeş ên rêveberiyên herêmî, rêxistinên navneteweyî û civaka sivîl heye. Bi karpêdana di perwerde û hîndekariyê de, baştirkirina gihandina çavkaniyan û zêdekirina beşdarbûna di biryargirtinê de, jin dikarin bibin xwedî hêz ku enerjiya xwe ya tevahî di beşa çandiniyê de bi cih bînin, beşdarî pêşkeftina domdar û aramiya aborî tê çespandin.

**Çarçoveya pratîk:**

- **Forma lêpirsînê:**

  **Nimûneya lêkolînê:** Nimûneya lêkolînê di ronahiya deverên jêrîn de hate destnîşankirin:

  - Qada erdnîgarî: Qada lêkolînê li gundên başûrê parêzgeha Hesekê (Erîşa û derdora wê) hate diyarkirin.
  - Qada mirovahî: Hejmara beşdarên lêkolînê 40 bûn.
  - Demjimêr: Daneyên di Sibat û Adara 2025'an de hatin berhevkirin û analîzkirin.

- **Pêşkêşkirina encamên lêpirsînê:**

  **Beşa Yekem: Agahiyên Kesane**

  - **Yekem: Temen**

Tablo (1): Belavkirina beşdaran li gorî temen

| % Percent | Frequency | Temen |
|---|---|---|
| 35% | 14 | 30-20 |
| 57.5% | 23 | 40-31 |
| 7.5% | 3 | Mezintir ji 40 |
| 100 | 40 | Encam |

Tabloya (1) nîşan dide ku piraniya beşdaran, bi rêjeya (57,5%), di navbera (30 heta 40%) de ne û ew (35%) ji nimûneyên di navbera (20 û 30) salî de ne, di heman demê de rêjeya temenê ji bo kesên ji 40 salî zêdetir kêmtir e, tê wateya ku lêkolîn bi piranî ji koma ciwan a jinan pêk tê.

  - **Duyem: Rewşa civakî**

Tablo (2): Dabeşkirina beşdaran li gor rewşa civakî

| % Percent | Frequency | Rewşa civakî |
|---|---|---|
| 0 | 0 | Ne Zewicî ye |
| 82% | 33 | Zewicî ye |
| 5% | 2 | Berdayî ye |
| 13% | 5 | Jinbî |
| 100 | 40 | Encam |

Tabloya (2) nîşan dide ku piraniya beşdaran, %82, zewicî ne.

  - **Sêyem: Asta xwendinê**

Tablo (3): Dabeşkirina beşdaran li gorî asta xwendinê

| % Percent | Frequency | Rewşa civakî |
|---|---|---|
| 0 | 0 | Ne Zewicî ye |
| 82% | 33 | Zewicî ye |
| 5% | 2 | Berdayî ye |
| 13% | 5 | Jinbî |
| 100 | 40 | Encam |

Tabloya (3) nîşan dide ku rêjeya beşdaran bi bawernameyên amadehî û navîn bi qasî (42%) ye, lê rêjeya bawernameyên dibistana seretayî ji (15%) kêmtir e û rêjeya kesên nexwendine tune ye, ev tê wateya ku bersiv ji bo jinên xwendekar e.

## Beşa Duyem: Kar û Çavkaniya Aborî

### Yekem: Xwezaya kar

Tablo (4): Dabeşkirina hevpariyan li gorî xwezaya kar

| % Percent | Frequency | Xwezaya kar |
|---|---|---|
| 10% | 4 | Kebaniya Malê |
| 40% | 16 | Çandinî |
| 32,5% | 13 | Hilbirîna Lawirî |
| 17,5% | 7 | Pîşe (dirûtin-şêranî-çêkirina xwarinê-..) |
| 100 | 40 | Encam |

Tabloya (4) diyar dike: Rêjeya karkerên jin di çandinî û sewalkariyê de zêde bûye û gihiştiye bêhtirî ji %70, lê rêjeya jinên malê kêm bûye ji %10.

### Duyem: Ezmûn (serborî)

Tablo (5): Belavkirina beşdaran li gorî ezmûna kar

| % Percent | Frequency | Xwezaya kar |
|---|---|---|
| 10% | 4 | Kebaniya Malê |
| 40% | 16 | Çandinî |
| 32,5% | 13 | Hilbirîna Lawirî |
| 17,5% | 7 | Pîşe (dirûtin-şêranî-çêkirina xwarinê-..) |
| 100 | 40 | Encam |

Tabloya (5) nîşan dide ku zêdetirî nîvê beşdaran xwedan ezmûna xebatê ya ji 3 salan zêdetir e, ku ev yek bandora nirxandina wan a şert û mercên xebatê zêde dike.

### Sêyem: Analîza bersivên beşa duyem

- Hûn xwe dispêrin vî karî wekî çavkaniya sereke ya debarê?
  Erê (Hejmar: 27, Rêje: 67,5%), Na (Hejmar: 13, Rêje: 32,5%)
- Ma hûn semyanên sereke yê malbatê ne?
  Erê (hejmar: 11, ji sedî: 27,5%), Na (hejmar: 29, ji sedî: 72,5%)
- Hûn hest dikin ku karê we dibe alîkar da ku rewşa aborî ya malbatê baştir bike?
  Erê (hejmar: 32, ji sedî: 80%), Na (hejmar: 2, ji sedî: 5%), Carinan (hejmar: 6, ji sedî: 15%)

Bersivên berê nîşan didin ku zêdetir ji nîvê beşdaran li ser vê xebatê weke çavkaniya sereke ya dahatê jiyana xwe bi rê ve dibin, ku çareyeke beşdaran debara sereke ya malbatên xwe ne û piraniya wan hest dikin ku karê wan rewşa aborî ya malbatên wan baştir dike.

**Beşa Sêyem: Hêrs (Zehmetî)**

- **Yekem: Zehmetiyên sereke yên di kar de**

Tablo (6): Dabeşkirina beşdaran li gorî zehmetiyên kar

| % Percent | Frequency | |
|---|---|---|
| 7,5% | 3 | Kêmbûna perepêdanê |
| 35% | 14 | Pirsigirêkên Belavkirinê |
| 20% | 8 | Bilindbûna lêçûnan |
| 15% | 6 | Bendên civakî |
| 22,5% | 9 | Kêmbûna perwerde û jêhatbûnan |
| 0 | 0 | Ji xeyînî wan |
| 100 | 40 | Encam |

Tablo (6) nîşan dide: zêdebûna pirsgirêkên belavkirinê, li dûv wê jî kêmbûna perwerdehiyê û lêçûnên zêde wekî dijwariyên herî berbiçav ên ku rûberûyî beşdaran tên.

- **Duyem: Analîza bersivên beşa sêyem**
  - Ma hûn ji ber karê xwe bi cudakarî an astengiyên civakî re rû bi rû tên?
    Erê (hejmar: 21, ji sedî: 52%), Na (hejmar: 10, ji sedî: 25%), Carinan (hejmar: 9, ji sedî: 22,5%)
  - Ma hûn bi dijwariyê hîs dibin gava hilberên xwe belav dikin?
    Erê (hejmar: 29, ji sedî: 72,5%), Na (hejmar: 4, ji sedî: 10%), Carinan (hejmar: 7, ji sedî: 17,5%)
  - Ma hûn di birêvebirina dema di navbera kar û malê de bi zehmetiyan hîs dibin?
    Erê (hejmar: 32, ji sedî: 80%), Na (hejmar: 3, ji sedî: 7,5%), Carinan (hejmar: 5, ji sedî: 12,5%)

Bersivên jorîn destnîşan dikin ku zêdetirî nîvê beşdaran bi cudakarî an astengiyên civakî re rû bi rû dimînin ku piraniya wan di birêvebirina dema di navbera kar û malê de bi dijwarî herweha bi zehmetiyên belavkirinê re rû bi rû dimînin.

**Beşa Çarem: Derfet û Analîza Wan**

- Ma hûn ji rêxistin û saziyên herêmî an navneteweyî piştgirî an perwerdehiyê digirin?

Erê (Hejmar: 31, Rêje: 77,5%), Na (Hejmar: 9, Ji sedî: 22,5%)

- Ger erê: cewhera vê piştgiriyê çi ye?

Piştgiriya darayî (hejmar: 26), peydakirina amûran (hejmar: 5), perwerdehî (hejmar: 31)

Bersivên beşdaran li ser pirsên berê diyar kirin ku: Piraniya wan piştgiriyê ji rêxistinên mirovî an navneteweyî werdigirin, û piraniya vê piştgiriyê ji perwerdehî û piştgiriya darayî pêk tê.

- Pirsgirêka herî mezin a ku jinên gundî li herêma we rûbirûyî wan tên çi ne?

Pirsgirêkên ku herî zêde hatine behskirin ziwabûn, bihayên zêde yên xwarinê, teknîkên xerab ên çandiniyê, hevsengiya kar-jiyanê, xwedîkirina zarokan, dahata kêm û xizanî bûn.

- Pêşniyarên we ji bo baştirkirina rewşa jinên ku di çandiniyê de yan jî di karsaziyên piçûk de dixebitin hene?

Piranî ji hêla beşdaran ve têne pêşniyarkirin, piştgiriya darayî - Pêşkêşkirina dezgehên belavkirinê ji bo zeviyên çandiniyê - Piştgiriya bi perwerde û alavên teknîkên nûjen ên avdanê - Piştgiriya ji bo lênihêrîna dayik û zarokan.

✓ **Encamên lêkolînê:**

Aboriya çandiniyê ya jinan pêkhateyeke sereke ye ji bo pêşxistina aborî û civakî li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê. Tevî zehmetiyên ku jin di vî warî de rûbirûyî wan dimînin jî, ji bo bihêzkirina wan di warê aborî de gelek derfet hene ku dikarin bi rêya wan xwe pêş bixin. Bi pejirandina polîtîkayên piştgirî, dabînkirina darayî û zêdekirina perwerde û hîndekariyê, rola jinan di çandiniyê de zêde dibe û pêşveçûna domdar li herêmê dikare bi zêdekirina piştgirî ji bo însiyatîfa çandiniyê ya jinan, berfirehkirina qada destgirtiyên çandiniyê, û pêşxistina stratejiyên ji bo zêdekirina gihandina jinan ji bazar û çavkaniyên çandiniyê ji bo baştirkirina rewşa wan a aborî û civakî di demeke dirêj de. Li vir hinek encamên lêkolînê hene:

- Jin li bakûr û rojhilatê Sûriyê pêkhateyeke sereke ya beşa çandiniyê ye, ku di bidestxistina ewlekariya xwarinê û pêşketina aborî de roleke sereke dilîze.
- Jin di gihandina perwerdehiya çandiniyê û perwerdehiya jêhatîbûnê ya nûjen de bi zehmetiyan re rû bi rû dimînin, ku şiyana wan a ji bo baştirkirina hilberîna zeviyên xwe sînordar dike.
- Jin bi astengiyên civakî re rû bi rû dimînin ku bandorê li tevgera wan a li derveyî malê dike, nikarin bigihêjin bazaran, bidestxistina kelûpelên çandiniyê an jî beşdarî di destgirtiyên çandiniyê de bibin, ev hemû xal dibin astengî li pêşberî pêşketina wan.
- Pirsgirêkên aborî hene ku bandorê li karê jinan di aboriya çandiniyê de li bakûr û rojhilatê Sûriyê dike, weke pirsgirêkên bazarkirinê, nebûna perwerdeyê û lêçûnên giran.
- Derfetên pêşxistina rola jinan li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê zêde dibin, bi zêdebûna hişyariya civakê li ser girîngiya rola jinan di geşepêdana aborî de, pêşxistina siyaset û bernameyên piştevaniya jinan di beşa çandiniyê de, û zêdebûna çalakiyên hin rêxistinên jinan ên herêmî û navdewletî ji bo piştgirîkirina cotkarên jin bi rêya perwerdekirin, daneyên darayî û parastina mafên wan.

- **Pêşniyar:**
  - Pêşvebirina perwerde û hîndekariyê: Bernameyên perwerdehî û rahênanê yên ku jinan ji xwe re dikin armanc da ku jêhatîbûna wan a çandiniyê pêş bixin.
  - Başkirina gihîştina darayî: Sazkirina bernameyên piştgiriya darayî bi taybetî ji bo jinan da ku bikaribin kelûpelên çandiniyê bikirin.
  - Xwedîderketina çandiniyê ya jinan bi pêş bixin: Destekê bidin qanûnên ku destûrê didin jinan bibin xwediyê zeviyên çandiniyê.
  - Başkirina binesaziyê: Jinûve avakirina rê û cihên çandiniyê ji bo hêsankirina gihîştina bazaran.
  - Bihêzkirina destgirtiyên jinan: Teşwîqkirina avakirina destgirtiyên çandiniyê yên ji aliyê jinan ve ji bo pêşxistina hêza xwe ya li bazaran.

### Çavkaniyên zanistî


1. (FAO, 2020), Jin di Çandiniyê de: Ji bo Pêşketinê Girtina Valahiya Cudahiya di Navbera Zayendan de.
2. (UNDP, 2019), Desthilatdariya Jinan li Sûriyê: Pirsgirêk û Derfet.
3. (UN Women, 2017), Rapora Beşdariya Jinan di Beşa Çandiniyê, Saziyên Gundî û Jiyana Civakî de.
4. (Rêxistina Jinên Ereb, 2019), Rastiya projeyên aborî yên li ser jinan li Sûriyê.
5. (UN Women, 2018), Rapora Komîsyona Rewşa Jinan: Zehmetî û Derfet Di Gihîştina Wekheviya Zayendî û Desthilatdariya Jin û Keçên Gundî.
6. (Rojnameya Lêkolînên Çandiniyê ya Sûriyê, 2019) Lêkolîneke analîtîk li ser faktorên herî girîng ên ku bandorê li hêzkirina jinan li Sûriyê dikin, wekî mînak Daraa.
7. (IFAD, 2023), Rojnameya Rastiyê: Jinên Gundî û Armancên Pêşveçûna Hezarsalî.
8. (Kovara El-Cumhuriye, 2022), Rastî û Daxwazên Femînîzma Sûriyê.
9. (Rêxistina Jinan a Niha, 2020), Beşa Lêkolîna Femînîst a Sepandî: Xwendina Kûrahî ya Jinên Sûriyê Li Ser Niha û Pêşerojê.
10. (Rapora Komîsyona Lêpirsînê ya Navdewletî li ser Sûriyê, 2023), Bandora zayendî ya pevçûnan li Sûriyê li ser jin û keçan.
11. (Qaseya Femînîst Fona, 2023), Tevgera Jinê li Sûriyê: Zehmetî û Derfet.
12. Agarwal, B. (1994). A Field of One's Own: Gender and Land Rights in South Asia. Cambridge University Press.

- ✓ **Pêveka Yekem: Jinine ji Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ku bi karên cuda di aboriya Çandinî ya jinan de beşdar in**





**Jinek ji gundê Erîşa di çêkirina xwarinê de kar dike**





**Jinek ji gundê Um Reqîba pirojeya wê ya kedîgeheke piçûk ji bo hilberîna hêkan û firotina mirîşkan heye**




Jinek ji gundê ERÎŞA di xwedîkirina mirîşkên bajarî de kar dike




Jinek ji gundê Ecaca di xwedîkirina elokan de kar dike

✓ **Pêveka Duyem: Forma lêpirsînê**

Pirsname ji bo lêkolîna zanistî - bersiv ji bo mebesta lêkolîna zanistî têne bikaranîn û ne ji bo armanceke din.

Ji kerema xwe re çargoşeyan ji bo bersiva hilbijartî dagirin:

1) Temen: ☐ 20-30 ☐ 31-40 ☐ Ser 40
2) Rewşa civakî: ☐ Nezewicî ☐ Zewicî ☐ Jinbî ☐ Berdayî
3) Asta perwerdehiyê: ☐ Seretayî ☐ Amadehî ☐ Navîn ☐ Zanîngeh
4) Xwezaya karê we yê bingehîn çi ye?

   ☐ Jina malê ☐ Çandinî ☐ Hilberîna lawiran ☐ Pîşekarî (dirûtin -çêkirina şêraniyê - çêkirina xwarinê - ...) ☐ Karên din (binavkirin: ______)
5) Ev çend sal e tu vî karî dikî? ☐ Kêmtir ji 1 sal ☐ 1-3 sal ☐ Zêdetir ji 3 salan
6) Hûn xwe dispêrin vî karî wekî çavkaniya sereke ya debarê? ☐ Erê ☐ Na
7) Ma hûn nandayê sereke yên malbatê ne? ☐ Erê ☐ Na
8) Hûn hest dikin ku karê we dibe alîkar ku rewşa aborî ya malbatê baştir bibe? ☐ Erê ☐ Na
9) Zehmetiyên sereke yên ku hûn di karê xwe de rûbirûyî wan tên çi ne?

   ☐ Kêmbûna fonê ☐ Pirsgirêkên belavkirinê ☐ Mezaxtinên zêde ☐ Nebûna perwerdehî û jêhatîbûnê ☐ Din (binavkirin: ______)
10) Ma hûn ji ber karê xwe bi cudakarî an astengiyên civakî re rû bi rû ne?

    ☐ Erê ☐ Na ☐ Carinan
11) Ma hûn bi dijwariya firotin û belavkirina hilberên xwe hest dibin?

    ☐ Erê ☐ Na ☐ Carinan
12) Ma hûn di birêvebirina dema di navbera kar û malê de bi dijwariyê hest dibin?

    ☐ Erê ☐ Na ☐ Carinan
13) Ma hûn ji rêxistin û saziyên herêmî an navneteweyî piştgirî an perwerdehiyê digirin?

    ☐ Erê ☐ Na
14) Ger erê, cewhera vê piştgiriyê çawa ye? (Hûn dikarin ji yekê bêtir bersivê hilbijêrin)

    ☐ Piştgiriya darayî ☐ Dabînkirina amûran ☐ Perwerde
15) Pirsgirêka herî mezin a ku jinên gundî li herêma we rûbirûyî wê tên çi ne?
16) Pêşniyarên we ji bo baştirkirina rewşa jinên ku di çandiniyê de yan jî karsaziyên piçûk de dixebitin hene?

Spas ji bo bersivan.

## Derbarê GAV de:

GAV ji bo alîkarî û geşepêdanê rêxistineke sivîl, ne-qezencî û bi pêşengiya jinan e ku li herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê çalak e û li Ferensayê qeydkirî ye. GAV di warên xwe yên xebatê de ji bo bidestxistina aramiyê di astên cihêreng de dixebite. Ew bi bernameyên xwe piştgiriyê dide beşên cihêreng weke perwerde, avakirina karînan, piştgiriya ewlehiya xwarinê herweha avakirina ewlehî û aramiyê. Rêxistin di warê hişyariya tenduristiyê de jî çalak e.

Ji nêz ve bi civakên herêmî re kar dike da ku piştgiriyê bide civaka sivîl, redkirina tundî û tundrewiyê herweha parastina aştî û jiyana hevbeş bi nerîna jinan.